



Dezgeha Rêkxistina Giştî a

PDKÎ semînareke teşkilatî

lidar xist

R:3



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (349) 06-05-2019 Buha (1000) Tûmen

Karbidestên rejîmê, terorîstên xwedîezmûn in



32.mîn pêşangeha navneteweyî ya pirtûka Tehranê li rêkefta 4 heya 14'ê Bane-merê, li Tehranê hate lidarxistin; Hevdem birêveberên pêşangehê ku rohn û eşkere ye ku ji aliyê Wezaretê Îtîla'atê û navendên cihê baweriyê yên "Beyta Rêberî"yê ve hatine danîn, hewla lekedarkirina nav û kesayetiyê rêberên gelê Kurd û li serwey hemiyên "Dr. Qasimlo" dane.

Di navber vê bi nav pêşangê de, binêreke tijî ji şermezari bo rejîma Tehranê berçav diket, ku tê de wênayekî rêberê lêhatî yê gelê Kurd danîbûn, û li kêlega vî wênayî, komek gotinên nerast û tijî ji bêrêzîkirin ku tenê kêrhatiyê wan bixwe, û sistema wan ya li gora sedsala navînî ye, li ser kesayetiyê "Dr. Qasimlo" nivîsandibûn.

Eva ku rohn e, Komara Îslamî ji riya vê hewla qirêj ve dixwaze cinayetkarbûn û terorîstbûna xwe bipeçêve. (Li 22'ê Pûşpera sala 1368'an de bû ku bi navê gotûbêjkirinê, destyêk ji dîplomat-terorîstên wê, xencera dilreşiya xwe gihandne singê tijî ji hezkirin û ronahiyê yê "Dr. Qasimlo", û ew şehîd kirin).

Tenê çend rojan piştî vê kiriyara çewtekarane ya rejîmê, ku nîşan ji tirsê koşka diktatoriyê ji bîr û hizra "Dr.Qasimlo" û raştiya rê û rêbaza şehîdên Kurdistanê ye, li pirogrameke televîzyonî ya rejîmê de, Elî Dayî bêy vê ku bixwe bixwaze, berçavka (maska) terorîstekî din yê tawanbar bi şehîdkirina "Dr. Qasimlo" vêde da. Ew terorîstê veşartî yê bi navê Emîr Mensûr Bizorgiyan bû ku, yek ji wan darêjer û encamderên serekî yê kiriyara terorîstî ya "Viyana" a paytexta "Utrîşê" bûye, ku piştî wergirtina çendîn xelatan û berprisayetiyên, di dawiyê de bi navê veşartî (nepenî) yê Serdar Xefûr, berprisayetiyê "Heraset" a giştî ya Saziya Deng û Reng" a rejîmê, û piştî jî bi navê Mişefa Mudebêr berprisayetiyê giştî ya kompaniya "Saypa" ya Îranê, ku hevdem berpirsê tîma topa pê ya "Saypa"ya Îranê ye jî, pê hatiye dan.



Rêuresma dewrên Femandehiyê yên "Hêza Pêşmerge Kurdistanê" dawî

pê hat

R:12

Kok û bine-
tarkeke rizî

R:2



Amerîka givaşên xwe li ser rejîma Îranê zêdetir dike

Bi armanca zêdekirina givaşan li ser komara Îslamî, dewleta Amerîkayê komek sînorên nû ji bo pirsên navikî ya komara Îslamî danîn.

Li rêkefta 4'ê Gualanê Amerîkayê ragehand ku her core alîkarîgihan-dinek bo vegeşandina Navneda Enerjiya Etomî ya Boşêhrê ku ji aliyê Rûsiyayê hatiye avakirin, wekî alîkarîdana komara Îlamî û cezayê taybet li pey xwe wê hebe.

"Morgan Arotagus" û berdevka Wezaretê Derve ya Amerîkayê, tevî belavkirina vê nûçeyê eşkere kir ku: Her core çalakiyek bo veguhestina Uraniyoma mehandî ya Îranê bo derve, eb welatê beramber jî bi sebeba vergirtina Uranyoma sroştî raştî cezayên Amerîkayê dibe.

Herwisa li Îranê daxwaz hatiye kirin ku, piroseya mehandina uranyomê bi tevahî rabigire, û herwisa gotiye jî ku: Li wir şûnda Amerîka îzin nade ku rejîma Tehranê, zêdetir li asta diyarîkirî ava giran embar bike. Dana biryara wiha li salroja vekîşiyana

yek alî ya Amerîkayê li Bercamê ye ku, bi sedema terhrîmên ku hatibûne vêdeda, nêdîsan hatin çalakkirin û îro rewşa komara Îslamî bi tevahî xîştiye bin rikêfa xwe.

Ev biryara Amerîkayê dijkiyara Yekîtiya Ewropayê lipey xwe hebûye ku, yek ji şîrîk û hevpêymanê Tehranê tê naskirin, û malpera fermi ya NY belavkiriye:

"Fericca Mogrini", berpirsa siyasetên Derve ya Yekîtiya Ewropayê, tevî Wezîrên Derve yên "Bîrîtaniya, Almaniya û Fransayê, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihandin ku: Hilveşandina tehrîmên navikî beşeke serekî ya Bercamê bûye ku egera bazirganî digel Îranê bihêztir dikir, belkû bandor li ser rewşa jiyana xelkê Îranê jî dadina.

Li hember de jî, çavdêrên siyasî bi vê baweriyê ne ku, helwêstgirtina Ewropayê ya bi îwî away tenê corek xweşîrînkirine bo Îranê, pirsek ku kesên nêzîkî Xamne'î bi dana "noqlên tal ji Tehranê re", dabûn nîşan dan.

Sergotar

Kok û bine-
tarkeke rizî

N: Kerîm Perwîzî

Ji wê demê şûnda ku deshilata Komara Îslamî heye, di çend dewre û qonaxan de heta ser lêwa Kendal çûye, lê di dawiyê de kariye bi firt û fêlan û xwehilkutanê û bi erzanfiroşkirina serwet û samana welat û heya îdeolojî û baweriyên xwe jî! xwe ji herifînê derbaz kiriye.

Yekem car di dawiya şerê malwêranker ê rejîma Xomêynî û Sedam de bû ku wê demê û di şerê bajarên de ku mûşekbarana bajarên Îran û Îraqê dihate kirin, êdî Komara Îslamî mergê xwe bi çavên xwe dît, û Xomêynî bi qewl tasa jehrê fir kire sere xwe.

Carek din piştî karesata Mîkonosê bû ku rejîma Komara Îslamî di dadgeha Mîkonosê de wekî biryaderê terora Dr. Seîd Şerefkendî ê rêberê PDKÎ hate nasîn û Xamineyî û Refsencanî û seranên rejîmê wekî tawanbarê serekî hatin nîşandan. Piştî vê bû ku Ewropayîyan pêwendiyên xwe ên bi vê rejîmê re gellek lawaz kirin, û bi neçarî Komara Îslamî terorîstên xwe ji Ewropayê vekişandin, û rêkêta bi milyardan Dolarî digel Ewropayîyan îmza kirin da ku xwe jê derbaz bikin.

Carek din jî piştî meşên sala 1388-an bû ku bi milyonan xelk rijiyabûne ser şeqamên Tehranê, êdî Xamineyî dawî demên jîyan axwe bi çavên xwe didît. Lê bona derbazbûna ji vê kirîzê di bin de digel Obama li hev kirin û soz da wan ku ewê piroseya çêkirina çeka navîkî ragirin bi vê mercê ku ew jî piştî meşvanan negrin!

Niha piştî destdirêjîyên rejîma Komara Îslamî ya Îranê

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ pîrozbahî li Dr. Peyman Babayî kir



Mîstefa Hicrî Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ pîrozbahî li Dr. Peyman Babayî re got.

Roja Şemî rêkefta 14`ê Banemera 1398`an, Mîstefa Hicrî Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ, pêşwazî û pîrozbahî li Dr. Peyman Babayî endamê PDKÎ û mamostay zanîngehê re kir, ku pileya nayab ya bawerînameya zimanê Îngilîzî li zanîngeha Selahedîn li bajarê Hewlêrê vergirtiye û ragehand ku ev şanaziyeke bo PDKÎ ku endamê wekî Dr. Peyman heye ku, tevî hemû kêmasî û kêmbûna îmkanatan û jiyana koçberiyê, bawerînameya bilind bi destveaniye.

Di hember de, Dr. Peyman Babayî tevî spaskirin û pêzanîn ji Mîstefa Hicrî bo pêşwazîkirina germ, ragehand ku, keyfxweşim ku, endamê PDKÎ me, û bas ji vê jî kiriye ku, netenê bawerîname min belkû, hemû jîyan û temenê min bo xizmekirin bi PDKÎ diyarî dikim û hemû perwerde û pêgehandina xwe qerdarê debîstana tijî li serbilindî ya “Qazî û Qasimlo û Şerefkendî” ne.

Li herêmê de û vegeşandina terorîzmê, Komara Îslamî cardin ketiye bin zexta bêreje û bêqas, û van zextên aborî û siyasî û emniyetî wisa rejîm xîstine tengawiyê de, ku ne tenê biryarên xwe nikare cîbicî bike, belku her carê û li kuncê Îranê hewla dapoşîna lawazî û kêmasiyan dide, û jê re cîbicî nabin.

Niha êdî pîvaz û temate û nan û benzîn û lehî û mirîşk û hêk û ...hwd rejîm hesabî xîstine tengawiyê de, ku îdi`a dikir ew birêvebriya hemû cîhanê dikan!.

Niha ew rejîma di cihê dabînkirina nan ji bo xelkê û derbazkirina lehîlêdayîyan, hêza serkutkar dişîne da ku destengan bédeng bike!

Serbarê vê bêçaretî û kêrnehatîbûna qeyranxulqînên rejîmê, berpirsên payebilind ên rejîmê jî ku dawiya deshilatê bi çavên xwe dibînin, her yek ji wan li pey hêcetê digerînin da ku hesaba xwe ji rejîmê cuda bikin, û aliyê kême ew samanên ku talan kirine û herweha canê xwe derbz bikin.

Ew rejîma ku ketiye qedeman û rizî û rezîl bûye, û kok û binetara deshilata wê xiloxe bûye, li ser lêwa Kendal li pey hejekê digere da ku destê xwe pê ve bigre, û nekeve kûrahiya dol û kendalê nemanê. Lê nirxa xwederbazkirina vê carê gellek giran e, û renge tiştêk nemabe bo firotinê!

Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ semînareke teşkîlatî lidar xist



Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ, bi armanca berhevdana kar û çalakiyên xwe yên di heyama yek sala derbazbûyî de û herwisa bername û karê pêşrojê û wezîfeya endamên hizbê di qonaxa niha ya xebatê de, semînareke teşkîlatî birêve bir.

Roja Şemî 30`ê Xakelêweyê, beşa Eşkere a Dezgeha Rêkxistina Giştî ya Hizbê, bi merema berhevdana kar û çalakiyên xwe yên di heyama yek sala derbazbûyî de, û herwisa bername û karê pêşeroje û erka endamên hizbê li qonaxa niha ya xebatê, semînareke taybet, bi amadebûna desteyek li birêveberên hemû komîteyên hizbê yên li Herêma Kurdistanê birêve bir Seminar bi ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji riha pak a şehîdên Kurdistanê destpê kir.

Piştire Dara Natiq, cihgirê Dezgeha Rêkxistina Giştî a Hizbê, bas ji armanca pêkanîna vê semînarê û rêzbenda karê semînarê kir ku li du panêlan pêk hatibû.

Panêla yekem, axavtinek li ser rewşa niha ya hizba Demokrat û erka endamên hizbê li qonaxa niha ya xebata ku ji aliyê Hesên Şerefi, berpîrsê Navenda Siyasî û cihgirê yekem yê Lêpirsyarê Giştî yê hizbê hate pêşkêş kirin.

Di panêla duyem de, axavtinek derheq kar û çalakiyên sala derbazbûyî yên li

beşa eşkere a Dezgeha Rêkxistin û bername û pirojeyên kar yên vê beşê di sala nû de, ku ji aliyê Tahir Mehmûdî berpîrsê giştî yê Dezgeha Rêkxistina Giştî a hizbê û endamê Desteya Kargêrî û Dara Natiq cihgirê Dezgeha Rêkxistinê anîne ber bas û di vê derheqê de axavitin.

Di panêla yekem de, Hesên Şerefi, bi hûrî erka endamên hizbê li qonaxa niha bo amadebûyan şirove kir. Navbirî got: Pêş hemû tiştî endamên hizbê hewceye şarezaya bername û siyasîyê hizbê û emegnasiya bi siyasîyê û rêbaza rêber û şehîdên hizbê, siyasîyê hizbê bibine nav komên xelkê Kurdistanê û bandorên balkêş yên civakê bo aliyê bername û armancên hizbê rabikêşin. Di rewşa taybet de, erka endamên hizbê girantir dibe, wate li hemû rewşekê de ku rûbirûyê metirsî û gefên topbaran û mûşekbarannên dijmin dibin, endamên hizbê dibe xw-eragirtir û bi gurr û bi coş li hemberî van metrisiyan de bisekinin û qamîtir di qadên xebatê de têkoşînê bikin.

Partiya Demokrat hertim di tengahiya de ciwane, di rewşa tengahiyê de endamên hizbê tevî baskirina arîşe û pîrsgirêkan, can goriya lipêy xema paraştina Partiya Demokrat û hereketa gelê Kurd a bi gorr û coşa xebatê têdikoşin.

me erkên yasayî û esasnameyî hene û erk û rewşên bicî û dijwar jî hebin.

Di qonaxên dijwar de, dibe bizanin ku çavan têkoşînê bikin û hereket xwe rabigirin û li qonaxa niha û asayî de, dibe bazna têkoşîna xwe berfirehtir bikin û li derfetan mifahê verbirgin û bibin hêzeke xwedî bandor.

Rejîm niha di rewşeke dijwar de ye û xebata neteweya me û gelên azadîxwaz yên Îran û Partiya Demokrat jî, li rewşeke xirab de ye, her bi vê sedemê ye jî, hewceye berfirehtir kar û çalakiyên xwe û têkoşînê berdewam bikin, û endamên hizbê, li derfet û ev guherînkariyên ku tîr pêş bi qazanca xebata neteweyî û azadîxwazî ya xwe mifahê jê verbirgin.

Rasan û stratîjiya bihevgerîdana xebata Bajar û Çiya ye, hewl û têkoşîna kadr û pêşmerge û endamên hizbê û piştewaniya komên xelkê Kurdistanê li tevgera Rasan

Hesên Şerefi:
Siyaseta druşt û gorîkirin û xwefidakirin a endamên me û kadr û pêşmergeyên hizb û piştewaniya xelkê Rojhilata Kurdistanê dikare me bike bi hêzeke xwedî bandor.

û siyasîyê rast û druşt yên Partiya Demokrat, gurr û coşa nû daye, û xebata neteweya me û yekgirtîbûn û hevxebateke neteweyî di asta Rojhilata Kurdistanê de pêk aniye.

Herwisa şerefi got: Dibe em hûrtir kar bikin zêdetir li caran xwe mandî bikin, karê tu endameke hizbê nabe kar li stûyê xwe vekirin be, dibe hewl bidin da ku bandorê dabînen da ku bi têkoşîn û mandîbûna bêhempa xwe bibin bi hêzeke bandordar.

Hekî em bihêz û bandordar bin, li ser me hesab bêkin û dikarin di guherîtinê de, yên welatê xwe de û di

arîşeyên hevpar yên siyasî de, daxwazkariyên neteweya xwe baştir cihgir bikin û derfet di berjewendiyên daxwazkariyên rewa yên me de bin.

Siyaseta druşt û gorîkirin û xwefidakirin a endamên me û kadr û pêşmergeyên hizb û piştewaniya xelkê Rojhilata Kurdistanê dikare me bike bi hêzeke xwedî bandor.

Di dawîya axavtina xwe de, amadebûyan pîrs û ramanên xwe derheq rewşa niha ya hizb û Rojhilata Kurdistanê Îran bi giştî li Hesên Şerefi re bas kirin û ji aliyê navbirî hatin bersiv dan.

Di panêla duyem a semînarê de, Tahir Mehmûdî, berpîrsê giştî yê Dezgeha giştî a Rêkxistina Hizbê û Dara Natiq cihgirê Dezgeha Giştî a Rêkxistina bas ji kar û têkoşîna li heyama yek sala derbazbûyî a Dezgeha Rêkxistinê kirin, di navxwe û dervey welat û bitaybet li Herêma Kurdistanê, tevî sipas û mandînebûnê li hewl û têkoşîna berdewam a endamên hizbê di hemû aliyên de, îşare bi ber bipêşvebirina asta çalakiyên beşa eşkere a Dezgeha Rêkxistinê di Herêma Kurdistanê kir, û hevdem kêmasî û girêftîr girêdayî vê beşê destnîşan kirin.

Piştire daxwaz ji desteya birêveberiya hemû komîteyan hate kirin, da ku bi îradeyê bilind û fidakarane û berxudariya endamên hizbê, li asta kar û çalakiyan berfirehtir bikin û hevkarî û piştewaniya berdewam a van li hêz û tevgera Rasan û xebata bêraveştan lipê xema armancên hizbê de têkoşînê bikin.

Di dawiyê de berpîrs û endamên desteya birêveberiya komîteyan, nêrîn û ramanên xwe yên pêwendîdar anîne ber bas û ji aliyê cihgirê Dezgeha Rêkxistinê bersiva pîrsyarsên amadebûyan hate dan.

Baran û bendav jî nikarin gola Ormiyê vejînin



N: Eskender Ce'iferî

Di demên dawiyê de bi baranên destkird, Sipaha Pasdaran ji xwe re hêncet peyda kir ku hêzên Heşda Şeibî û Fatmiyûn derbasî Îranê bike. Di vê navberê de va baranan karîbû heya aştêkê ava gola Ormiyê zêde bikin. Lê ji ber cudahiya di navbera ava xwê a taybet a golê, ew av qet nikare golê vejîne û ji zuhabûnê rizgar bike.

Rejîm, êdî ji pirojeyên vejandinê jî bêhêvî bûye û bûdceyên wan qut dike yan bûdceyê kêmtir dike. Heyamê beriya van baranên destkird, rêveberê Navenda Çavkaniyên Avê yên gola Ormiyê ragihandibû ku di demên dawiyê de aştê baranbarînê li navçeyên derdora golê daketiye û di encamê de plana wan ya ji bo vejandina vê golê rastî hin aştengiyên hatiye û pêwîst e dewlet di vê derbarê de bûdceyê zêdetir terxan bike.

Elîriza Mûsewî teqez jî kiribû ku ewê pêdeçûnê di plana xwe de bikin û pêwîst e plana B, rêkarên baştir lixwe bigire da ku eger aştê

baranbarînê jî kêmtir bibe, bandoreke zêde li ser plana vejandina gola Ormiyê tinnebe lê ji bo vî karî, pêwîst e dewlet bûdceya vejandinê ji çend milyar Tumanan heya 100 milyar Tumanan bilind bike. Ji ber ku di sala derbasbûyî de bi lihemberdana ligel sala berî wê nêzîkî 26 ji sedî rêjeya baranbarînê kêmtir bibû, niha ew ava ku ji bendavan derdikeve û diçe nav golê, bi heman qasî kêmtir bûye. Lewma jî di heyama salekê de ava golê zêdetir paşde çûbû û zuhabûna wê rengekî cidîtir bixwe ve girtibû. Lê baranên destkird, dikarin heya demekê, vê zuhabûna zêdetir, veşêrin.

Ew berpîrsê Îranî herwisa dibêje divê li gor bûdceya dewletê riftar bi golê re bê kirin lê mixabin bûdceya ku ji wezaretê Çandiniyê re tê dayîn, qet ji bo karên plana vejandina golê nayê mezaxtin û ev jî di demekê de ye ku li gor biryarnamê dewletê, beşek ji van erkan dikeve stûyê vê wezaretê.

Mûsewî got jî eger dewlet bi awayekî berpîrsyarane tevbigere, divê bûdceya pêwîst terxan bike û her sal jî hin rêkarên nû ji bo pirojeyên çandiniyê bide wezaretê Çandiniyê da ku av, bêmifahiya neçe û herî zêde ji sîstema avdêriyê a pêşketî mifahiya wergirtin û ew ava ku zêde dimîne, ji bo gola Ormiyê bê veguheştin.

Eger ew proje bi awayekî standard bêne encamdan, wê



demê dikarin bi qasî 8 ji sedî ava parêzgehê veguhêzin golê ku ew jî dikare bandoreke erênî bike ser zuhabûna wê ji ber ku êdî wê aveke zêde li pişt bendavan bimîne.

Heya niha plana B ji Navenda Çavkaniyên Avê yên Gola Ormiyê re nehatiye danîn û lewre dema ku rêjeya baranbarînê dadikeve, tevahiya rêjeya ava pişt bendavan ji bo çandiniyê tê bikaranîn û bi vî karî jî enbara avê vala dimîne û nikare heya salekê bandoreke erênî bike ser plana vejandina golê.

Gotinên vî berpîrsê dewletê di demekê de ne ku beriya niha di dema piropagandeyên hilbijartinên serokkomariyê de ku Hesên Rûhanî dixwaşt ji bo cara duyem bibe serokkomar, Rûhanî bixwe serdana Ormiyê kir û di derbarê hewlên xwe de ji bo vejandina gola Ormiyê got ew gol, 120 cm kêmtir bibû, lê min qewl dabû xelkê Ormiyê ku

ezê vê golê ji mirinê rizgar bikim, lewra min soza xwe bi cih anî. Min karî 10 cm ava gola Ormiyê bi lihemberdan ligel sala 2014'an zêde bikim û niha jî em bo zêdekirina ava gola Ormiyê di nava hewlên berdeyam de ne. Lê berovajî gotinên wî, piştî heyvekê dîsa aştê avê kêmtir bû û xuya dibe ku zêdebûna ava golê, tenê ji ber barîna zêde a baranê bûye neku ji ber veguheştina avê ji bo wir yan jî bidawîkirina çêkirina bendavan.

Hinek çalakvanên jîngehê jî dibêjin eger dewlet dixwaze gola Ormiyê ji zuhabûnê rizgar bike, divê ew pira ku di navbera Ormiyê û Tewrêzê de ji nav golê derbas bûye, bê rakirin. Ji ber ku pir li ser kaniyên sereke ên bin erdê de û bi çimentoya pêşesaziye hatiye çêkirin ku rê nade ava kaniyên siruştî ên taybet bi golê ku ava şor e, derkeve û biherike nav golê.

Çalakiyên teblîxî li Kurdiştanê berdeyam in

Endam û alîgirên PDKÎ, li bajarên wekî, Seqiz û Bokanê çalakiyên teblîxî lidar xistin.

Xebatkarên Demokrat li bajarê Seqizê, bo piştvanîkirin li PDKÎ û berdewamiya xebata Rasanê çalakiyên teblîxî lidar xistin.

Xebatkarên Demokrat bi

siloganên wîkî: Bijî PDKÎ, Rasan sedema yekgirtina gele, Rasan zaminê serkevîna gele û Rasan dijî tarîtiyê berdewame, çalakiyên teblîxî lidar xistin.

Herwisa xebatkarên Demokrat li bajarê Bokanê jî, çalakiyên teblîxî birêve birin.

Ciwanên jêhatî û çavnetirs

yên bajarê Bokanê, tevî daliqandina alaya Kurdiştan û bi xwîna xwe navê PDKÎ li ser alaya Kurdiştanê nivîsîn, û bi wî awayî soz û emegnasîya xwe nîşan dan.

Endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, bi encamdana çalakiyên teblîxî li bajarên Kurdiştanê, piştvanîya xwe li



bizava rizgarîxwazî ya Kurd û aciziya xwe li rejîmê nîşan didin.

Rojek ji rojên zîndana Diyarbekirê



N: Bûbê Eser

“Rojekê min girtiyên qawîşa xwe derxistibûn meşê, û sirûdên leşkerî bi wan didan xwendinê. Lêdan û îşkencên min jî berdewam bûn. Ji ber ku em her gav ji aliyê yuzbaşî ve dihatin kontrolkirin. Di demên meşê de, eger me lêdan nekira, em ne li gor dilê wî bûn. Loma kesên îşkence û lêdan li girtiyan nekirina, yuzbaşî ew dişandin cihê wan ê ecemitiyê.

Hey tepe-repa jopê min, û qêrîn û warîna girtiyan bû ku dîna min dît, gardiyanekî din gazî min kir, ez çûm ba wî û wî got:

-Gardiyan! Afrinadineke nû (dîtineke nû) ya îşkencê hatiye dîtîn. Ka tu jî li qawîşa xwe biceribîne. Wî ji min re hemû şiklên dîtina îşkenceya nû şirove kirin. Li wê salonê bi hindikî, qasî 20-30 gardiyanî jî, ji bona ceribandina vê metoda nû sekinî bûn. Di vegeerê de em bi hev re hatin nava girtiyên ku meş dikirin. Min ew dan sekinandin. Di demên seknê de kêfa wan dihat ku ew ê bikaribin, hinekî hilma xwe vekin. Ma wan ji ku dizanîn ku ez ê metodeke nû di serê wan de biceribînim. Loma min emir da û got:

-Qawîş, li ser çar rêza û bila di nava her rêzekê de qasî du metre navber hebe, rawestîn!

Wan derhal ev yeka pêk anîn, çar rêz û di nava her rêzekê de qasî du metre navber vekirin, û li benda min rawestîyan.

Min gazî berpirsiyarê girti-



yan kir û got:

-Mesûl!

-Emir bike komûtanê min!

-Here qawîşê û çar pakêtên cixare bîne, zû!

-Tu emir bike komûtanê min.

Piştî hatina mesûl û cixaran, îca min emir da û got:

-Qawîş! heta sisiyan divê ji navê û berjêrtir tu tiştek li ser we nemîne, dê heydê zû. Yeeek, dido... û sisêêê.

Herkeseke ji navê û berjêrtir xwe tazî kiribûn, tenê fanîleyekî tenik li wan mabû, îcar min dîsa gazî mesûl kir û got:

-Mesûl!

-Emir bike qomûtanê min!

-Her girtiyekî cixarakê bidê û cixara wan ji wan re vêxe.

-Tu emir bike komûtanê min.

Êdî di destê her girtiyakî de cixareyeke vêxiştî hebû. Dor hatibû, ceribandina wê îcata nû.

Min li dora xwe nêhîrt û dît ku yuzbaşî di şibaka jor de li min mêze dike, kêfa min hat. Loma ez bêtir har û dîn

bûm ku îşkenceyek baş bi wan bikim da ku aferîmekê ji yuzbaşiyê xwe bigrim. Hema ez bi ser qawîşê de qêriyam:

-Qawîş xwe daqûl bikin!

Herkesê xwe daqûl kirin, serên wan, bi ber erdê de û qûna wan li jor bû. Ez bi rêzê ketim û min ew cixara ku di destê wan de yek bi yek xîste qûna wan. Piştî ku min cixare di qûna wan de bi cih kir û got:

-Qawîş divê hûn îro cixarên xwe bi qûna xwe bikêşin. Eger cixara kê bikeve, ji xwe ne hewcwe ye ku ez ceza we bêjim. Hûn bi xwe dizanin. Dê heydê zû bikin.

Ez wer bawer im ku bi qûnê cixare kişandin, li cîhanê cara yekem bû ku me di girtîgeha Diyarbekirê de pêk anî. Dema me li wan mêze dikir, kenekî em digirtin. Em him dikeniyen, him jî me dikir qîrewîr, da yuzbaşî me bibîne ka em çawa lêdanê û îşkencê bi dijminên milletê xwe dikin. Bi rastî jî di demên weha de kêf kêfa me bû. Him yuzbaşî li me û rewşa wan girtiyan temaşe dikir, him jî me dizanîbû ku ew ê aferîmeke qenc bide me. Ew dîmeneke gelekî xweş û delal bû. Hemû girtiyan xwe qûnbelotkî kiribûn, di qûna wan de jî cixare hebû. Dûman bi ser qûna wan

diket. Di rewşên weha de kêf dibû kêfa me û ya yuzbaşiyê me.

Di bin vê tirs û xofê de cixara yekî îxtiyar ji qûna wî ket. Dema cixara wî ket hema me geleskan bi hev re êrîşî ser wî kalî kir. Me her yekî ji alîkî de dest bi lêdana wî kir. Temenê wî li dor 50-60 bû. Dibû ku ji ber temenê xwe wî nikarîbû, qûna xwe baş bigirta. Loma jî cixara wî ket û lêdana ewilî jî wî bi xwe xwar. Him me li wî dida û him jî min ji wî re digot:

-Çima cixare te ket? Wî got:

-Komandanê min, hundirê min gaz kir û ji ber wê cixare ket. Eger hûn wê dîsa bi cih bikin, ez ê hîn bêtir hewl bidim ku nekeve.

De îca lê bide û lê bide, hetanî ku ew kes, di nava destên me de ji heşê xwe çû. Dûre me dev jê berda. Lêdan bi dilê yuzbaşî bû ku wî hîn jî li me temaşe dikir. Piştî ketina wî kesî, qawîş êdî xilas bû bûn, me ew xistin hundir, du kesan jî rahiştin mirovê kal û birin qawîşê.

Ma me kê guh dida kalo, em bi dar û joban bi kesê ku di şûna bavê me de bû ketibûn. Qet ne dihat bîra me ku niha hinek weha li

Li bajarê Bokanê çalakiyên teblîxî hatin lidarxistin

Endam û alîgirên PDKÎ li bajarê Bokanê çalakiyên teblîxî lidarxistin.

Li gorî nûçeya ku gihîştîye malpera "Kurdiştanmedia"yê, xebatkarên Demokrat bi daliqandina alaya Kurdiştanê û cemedaniyê, piştewaniya xwe li Partiya Demokrat a

Kurdiştana Îran û berdewambûna Rasanê ducarî kirin.

Endam û alîgirên PDKÎ li bajarê Bokanê, bi daliqandina alaya Kurdiştanê, hildana cemedanî û bi nivîsîna dirûşmên wekî: "Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê û Rasan", li bajarê Bokanê li cihên wekî, "Naleşikêne,

Kultepe, gundê Îngîce û li serriya gundên Kanî Tebet, Qilic û Albilax, çalakiyên teblîxî birêve birin.

Endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, bi encamdana çalakiyên teblîxî li bajarên Kurdiştanê, piştewaniya xwe li bizava rizgarîxwaziya Kurd û acizîya xwe li rejîmê nîşan didin.



»»» Doma R: 5

bavê me bikin, em ê çî bikin. Yuzbaşî em çavsorî kiribûn. Me nema dikarî bû tu tiştêkî baş û însanî bikira. Dema bûyerên weha qirêj ku min bi xwe gelekê wan dikiirin tene bîra min, ez bi xwe şaş dimînim ku çawa min ew tişt dikir. Gotin zor e, lê bawerîkirin zemetir e. Gelek tişt weke xeyalan e, lê rast in, min bi xwe jî tiştên weha gelek kirine.

Hingî me sosretê giran bi serê wan girtiyan de anîbûn, êdî me jî nizanîbû em ê çî tiştên din binin serên wan. Weha li wan hatibû ku wan çawa bikirana, diketin feqa me ya ku me ji bo lêdanê her gav vedida. Hingî me şikil û metodên îşkence ji bona wan îcat kiribû ku êdî li gor me tu tiştêkî zor nemabû. Îca em bi tiştên hûrik û rindik ketibûn. Lê dîna ku me dît ew tiştên hûrik, ew qedexekirinên ku em qet li ser nedifikirin tesîrekê nebaş li ser girtiyan dihişt. Dema me wan tiştên hûrik xiste jiyane, me dît ku wana ji lêdanê, ji tî û birçibûnê bêtir tesîr li ser wan dihişt. Em baş tîgihiştin ku ji bona wan, ne ew lêdana fizîkî, lê îşkencên pisîkolojîk bêtir tesîra xwe dihele. Êdî heta ji destê me dihat, me dest bi ûsul û metodên weha kir.

Me li wan weha kir ku êdî di hundirê qawîşan de ji bilî hin pêwîstîyan, axaftina bi hev re hatibû qedexekirin, ken û henek hate rakirin. Çûyina toweletê an ji cihêkî hetanî cihêkî din ya hundir qawîşê, bûbû nîzamî. Dema kesek biçûya toweletê pêwîst bû ku ew kes bi nîzamî ji cihê

xwe raba, herdu destê xwe bi nigên xwe ve bizeliqanda, ne bi meşeke serbest, lê bi meşa nîzamî biçûya û bihatana. Razan jî bûbû bi nîzamî, weke; dema kesên radizan, pêwîst bû ku li ser piştê razana û her du destê xwe bidana ser sînga xwe. Eger kesek ji vî halî de biketa halekî din an jî hin kesan xuraxur bikirana pêwîst bû, nobedarê şevê ew hişyar bikirana û ew bi nîzamî bidana razandin. Eger girtî ji ber ne nîzamî razanê û xurexurê nehatana şiyarkirin û kesên weha ji teref gardiyanekî de bihata dîtin, ji dêlva kesê razayî, ew kesê nobedar ceza dikşand. Lê ew kesên di xewê de dikirin xurexur tebata wan ji destê nobedaran tune bûn. Her ku deng bi wan diket nobedaran ew hişyar dikirin, gelek kesên weha ji bê xewbûnê aqilê xwe wenda kirin.

Bi roj, di demên îstirehetê de pêwîst bû ku herkes bi awakî nîzamî rûništa û çongên xwe bikirana zikê xwe de. Destên xwe bidana ser hev, da ku ew bi awayekî nîzamî rûniştana. Nigdirêj kirin, nigavîtina ser hev, cezayê wê hazir bû. Me kesên weha du saeta dixiste lexema (li derve li cihê talîmê cihoka ku ava gûyê toweletê tê re derbas dibû, hebû).

Dîtina wan tiştên li gor me ne nîzamî, rehet bûn. Ma me ji bo çî hevalbendê xwe di qawîşan de dabûn çêkirin, bi saya wan agahdariya me ji her tiştên hundirê qawîşan çê dibûn. Ya jî, dema me qawîş di wan qulikên di dîwaran re kontrol dikirin, didît. Tenê ew qawîşên ku hîn me zilamên li gor dilê xwe têda

nedabûn çêkirin, wan ji herkesî kêmtir lêdan dixwarin, û me qawîşên weha jî ji hemiyên din bêtir kontrol dikirin.

û ji bo ku ez venegerim cihê ecemîtiyê, heta ku ji min dihat, min lêdana xwe qenc dikir. Min wer dikir ku dema yuzbaşî dibihîst an wî bi xwe di demên kontrolên xwe yên bi dizî dikir didît, gelekî kêfa wî dihat, loma car carna banî min dikir û digot:

-Kurê min, li gor agahdariyê ku ez distînim, tu ne mirovêkî xerab î, eger ev rewşa te her dem berdewam be, tê li vir bimînî, û tu wê gelek diyariyan jî ji min werbigirî, ez ê te bikim "onbaşî", an "çawîş". Dema tu bibe "çawîş" tu ê pereyekî baş jî bigrî.

Tu wê bibî mirovê min yê yekemîn. Lê heta taliya leşkeriya min, ne ez bûme mirovê wî ê yekem, û ne jî min tu me'aşekî zêdeyî hevalên xwe girt.

Dawiya dawî ez tê gihîştim ku "yuzbaşî" ev yeka hanê ji her kesên ku wê bibana gardiyan re digot.

Wî ez maçî kirim, aferîneke qenc li min da, kêf bûbû kêfa min. Ez ketibûm, çavê yuzbaşiyê xwe. Êdî hevî û baweriya min çê bibû ku ez ê li girtîgehê bimînî. Bi kêf û eşqa ku ez ê li wir bimînî, min êdî lêdan û îşkenceyên xwe hîn zortir û dijwartir kirin. Berî ku rojên min ên ceribandnê biqedin, yuzbaşî banî min kir û got:

-Kurê min! tu weke ku ez

difikirîm derket. Ez dikarim bi awayekî rehet bêjim; rewşa te ji ya hevalên te cudatir e. Loma êdî ez dikarim te li vir bikim komûtanê qawîşekê. Êdî ew qawîş wê ya te be, tu bi wan çî dikî, bike tu azad î. Daxwaza min ji te ew e ku bila tu carî zikê te bi wan neşewite.

Ew gişt, gawir in, dînsiz in, xwedê nenas in, ew dijminên welatê me, polîs û leşkerên me ne.

Em ew kesên li wê girtîgehê bûbûn gardiyan, bi her awayî azad bûn.

Çî tiştên ku me bixwasta me dikarîbû bikira. Xwarin û vexwarin pir û xweş bûn. Vexwarina araqê an jî kişandina esrarê ji alî yuzbaşî de hatibû serbestkirin, kişandin û vexwarina wan, ji alî wî de dihat dabînkirin. Car carna wî digot:

-Di demên xwe yên vexwarinê de herin nava wan xwedê nenasan, wê gelekî baştir be. Wê demê hûn ê bikaribin baştir li wan bidin. Heta ku hûn fêr bibin, vexwarin ji bo we serbest e.

Wî her sibe, berî destpêka kar, em hemû dicivandin, nesîhet li me dikir, wî bi xwe em fêrî lêdanê dikirin. Wî di axaftinên xwe yên serê sibana de, em bi kîn û nefretê dadigirtin û bi ser wan kesên girtî de dişandin.

Bi wê kîn û nefretê me jî ew kesên di wir de hemû xayîn û dijminê gelê xwe didîtin. Di bin bîr û baweriyeke weha de dema me lêdan dikir, kêfa me gelekî dihat ku me dijminê gelê xwe dianîn ser rêya rast".

Nerîna Lîderan



Mike Pompeo:

“Hewelatîyên Îranê lêhatiyê hikûmetek baştir in”.



Benjamin Netanyahu:

“Em bi tena serê xwe li hemberî cîhanê derheq lihevkerina navikî ya metirsîdar ya digel Îranê sekinîn.”



Selaheddin Demirtaş:

“Hilbijartinên 31'ê Adarê hêz û roleke diyarîkirî ya Kurdan di hilbijartinên Tirkiyê de nîşan dide.”



Ruhanî:

“Amerîka haydar nine, lê em li 6 rêyên din nefta xwe difiroşin.”

Duriyek asê û dijwar



N:Selim zencîrî

Serhişkî û serkêşiyên rejîma îslamî ya Îranê çarenivîsa wî welatî gihandine nuqteyek dijwar û zirav. Vê rejîmê cehd kiriye li şop û rêbazên dujminkarane û alozî afirên xwe de berdeyam, û hevdem cilîdanê bi hespê terorîzma xwe li dever û cîhanê de bike û xwe jî li hember tu yasa û rêsayek navnetewî de berpirsiyar nezane! Hevdem îdareya nû ya Amerîka jî bi têgihîştin ji cewhera raştin a rejîmê, bûye berbenda ser- eke ya li hember serkêşiyên rejîmê.

Bi derketina Amerîka ji rêketina “Bercam”ê gelek hevkeşe hatin guhertin û niha qonaxek nû ji berbirûbûnê derketiye rojevê. Vegera dorpeçan li ser rejîmê û çêbûna kempîna berfireh ya cîhanî bona îzolekirina pitir a rejîmê, û polinkirina Sipaha Paştaran weke rêkxistinêke terorîstî û niha jî bi “Sifir”gihandina aştî firotina neftê, zûtir ji wê ku dihat çavnihêrîkirin, bandora xwe kirine û rejîm hevrişê diwartirîn qonaxên jiyana xwe ya teji cinayet hatiye. Ger rewş weha berdeyam bike renga sene'ta petroşîmî a rejîmê û ... hwd jî bikevin ber tehrîman.

Niha tesîr û karîgeriyên dorpeçan li ser jiyana xelkê û pêdviyên rojane yên wan ewqas zêde bûne ku êdî xelk nikarin li bin barê girane vê jiyana bi felaket de berdeyam bin. Ji hêla din ve jî tepeserî û çavsoyîyên rejîmê li dijî xelkê gihane aştêkê ku ji tirsî nerazîbûn û serhildana xelkê, baweriya rejîmê bi hêzên tepeserkar ên xwe nemîne û gurûpên terorîstî weke “Heşda Şeibî”ê “Hiz-



bulaha Lubnan” û ... bona serkutkirin û pêşgirtina ji nerazîbûnên xelkê vexwendine Îranê û cihgîr kirine.

Niha rejîm maye navbera nal û bizmar de! Gelo 12 xalên Amerîka weke merc bona got û bêj û rawestandina givaşan bipejirîne û teslîm bibe, yan berxwe bide û berdeyam be li serhişkî û serkêşiyên deverî û cîhanî de!?

Take hêviya rejîma Îranê, berxwedan û demkuştin e heya hilbijartinên sala bê ya serkomariya Amerîka û hatine serkar a demokatan!. Lê xuya ye ku Îdareya Tramp jî dixwaze teslîmkirina rejîma Îranê weke deskevt bo hilbijartinê dubare ya xwe bikar bîne, lewma rengê hindê nade ku li helwestê û givaşên xwe bo ser Îranê de paşde vegere.

Bi kurtî, sala pêşberî me gelek çarenivîssaz e. Rejîm neçar e li van du riyên asê û dijwar de, riyekê hilbijêre. Ger teslîmî xwaştên Amerîka bibe, eva li cewher û kakila xwe ya raştin dîr dikewe! Û durûşm û gotinên wan li dijî Amerîka, Îsraîl û ...hwd dibine bilqa ser avê û ji hindik

hitbara mayî jî dikewe.

Na! Ger serhişkiyên xwe bidomîne, givaşên dorpeçan û nerazîtiyên ji vê sîstemê de xelkê bîne ser şeqaman û ji kuntirola rejîmê de derkeve û nemaze renga raştî êrişê jî were!

Bi wateyek din, yan guherîna reftar! eva ku niha Amerîka tekezê li ser dike, û li egerek wusa de tenahî û aramî vedigere deverê û demokrasî pêş dikewe. Yan jî guherîna rejîmê ku hingê bi qazanca gelên Îranê, cîhan û bi giştî hemû mirovahiyê dibe.

Ya girîng ew e ku gelên Îranê bêdeng nemînin û bi derketina ser şeqaman, xwaşt û daxwaziyên xwe bînin rojeve. Hevdem opozîsyona raştin a rejîmê jî bi erka xwe rabe û bi piştgirîkirin ji xwaştên rewa ên gel, xwe bo her egerekê berhev bike. Bi taybetî kurd dibe hevdem li gel paraştina yekîtiya xwe, vê gotina pêşiyar “şerê ser bengê, baştir e ji sulh û aştiya ser coxînê”berçav bigrin daku wekî şoreşa 1979'an ya gelên Îranê serê wan bê kilaw nemîme.

30 saliya terorkirina Dr. Qasimloyê rêber



N: Azad Kurdî

Havîna îsal 30 sal bi ser terorkirina rêberê mezin ê Kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo derbas dibe. 13ê Pûşpera 1989'an yek ji rojên herî nexweş û ji bîrnekirî ye bo hemû tevgera zadîxwaziya cîhanê û Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi taybet. Di vê rojê de, dîplomatên terorîst ên rejîma Xomêynî li ser maseya gotûbêjkerin li ser pîrsa kurd li Îranê, rêberê navdar û mezin ê kurd Dr. Qasimlo dane ber hêrişa guleyan û ligel kekê Ebdula Qadirî Azer şehîd kirin. Li gor belgeyên bicîmayî ji civînê, derdikeve ku tenê Dr. Qasimlo diaxive û bi hemû aliyan berevaniyê ji maf û azadiyên xelkê Kurdiştanê dike, terorîstên Îranî çî nabêjin û naaxivin. Ji ber ku di bingeh de armanca wan tenê terorkirina Dr. Qasimlo û kek Ebdula bûye.

Xala herî reş li vê kiriyara terorîstî û ji wê nexweştir jî çawaniya liv û tevgera hikûmeta wê demê ya Otrîş (Austria) ye. Ligel ku Polîsê wî welatî agahdarê dem û ciyê civîneke wiha bûye, lê heta cinayet neyê kirin, Polîs nehatibûn cihê civînê! Bikuj û yerorîstên Îranî li pêşberî cihê civînê û yek jî dûrtir li malê dema dihelê, tèn girtin û piştî dermankirinê, di 24 demjimêran de vegehrînin bo Tehranê. Çend j iwan jî ku alîkar bûne, diçin balyozxaneyê rêjîmê li Vîyena. Berevajî hemû bingehên huqûqên navdewletî, edalet û pîrensîpên mafê mirovan, hikûmeta Otrîşê dosiya terorkirina Dr. Qasimlo bi radeştirina terorîstan bi vî welatî girt. Ev lekeya reş 30 sal e di nav çavên siyasetvan û karbidestên Otrîşî de maye û heta dosiya neyê vekirin û



terorît û rejîma Îranê neyên hemkemekirin dê her bimîne. Xwîna paqij a rêberê nemir Dr. Qasimlo û kekê Ebdula bû qurbanîyê dan û şandinên aborî yên navbera rejîma terorîstperwer a Îranê û Otrîşê.

30 sal bi ser terorê derbas bûn

Bê guman gelê kurd û bi taybet PDKI nikare ji vê xedr û xiyaneta dewleta Otrîşê bi hêsanî derbas bibe. Divê bi hemû awayên pêwîst liv, tevger û çalakî bihên lidarxistin bona şermezarkirina vê bê pîresîspiya û bêexlaqiya hikûmeta Otrîşê û zext bo van bihê anîn bona vekirina dosiya terorkirina rêberê şehîd Dr. Qasimlo û kekê Ebdula ku li ser axa wan hatiye kirin.

Ev 2 sal in ku PDKI bi çalakiyên cuda salvegera şehîdkirina rêberê xwe dike derfetek bo nîşandana nerazîbûn li hember vê zilm û bê edaletiya Otrîşê. Serdankirina balyozxaneyên Austurîa li çendîn welatên cîhanê li aliyên şandên PDKI, li-

darxistina xwenîşandan û meşên nerazîbûnê li pêşberî balyozxaneyên Otrîşê li çendîn wletanan û şandina nameyêke taybet bo hemû balyozxane û dezgehên fermî yên wî welatî. Bê guman di salên pêş de divê çalakî berfirehtir bihên kirin.

Di 30mîn salvegera terorkirina Dr. Qasimloyê nemir de, bona şermezarkirina rejîma terorîstperwer a Îranê û dewleta Otrîşê, PDKI biryar daye, meşeke nerazîbûnê ya herî berfireh li bajarê Bruksel ê Beljîka û li pêşberî avahiya Parlemana Ewropayê birêve bibe. Ev meş girîngiyêke taybet bi xwe heye. Dibe ku çalakî berfirehtir û micidtir bibin heta ku hikûmeta Otrîşê daxwaza lêborînê ji gelê kurd û PDKI bixwaze û dosiya terorkirina cinayeta 13 Pûşpera 1989an bikeve kar. Bê guman karbidestên Otrîşê naxwazin ku herin bin barê vê bêbextiya ku kirine li dijî gelê kurd û piştgirî ji terorîstên Îranî, lewma ev erkê rêvîngên rêbaza Qasimloyê nemir û hemû kurdeke welatparêz û azadîxwaz e ku bibin hevkar

û hevdeng ligel PDKI bona bikarxistina dosiya terorkirina Dr. Qasimloyê rêber.

Kurdiştan divê biherike û ji xwîna Dr. Qasimlo xwedî derkeve

Hevdem ligel diyasporayê, bo mehkûmkirina vê kiriyara terorîstî ya rêjîma Îranê û xwedî derketin ji xwîna rêberê xwe, hewce ye weke salên berê li hemû gund û bajaran bi awatên pêwîst çalakiyan lidar bixin û Kurdiştanê bikin qada nîşandana nerazîbûnê li rêjîmê.

Îradeya gelê kurd ji vê hindê mezintir e ku rêjîma Îranê jê re xewn û xeyal kiribûn û dike. Her eva ku rojane niha dehan keç û xortên Kurd li Rojhelata Kurdiştanê rû dikin çepera pîroz a Pêşmerge li çiyayên Kurdiştanê û li mekteba Pêşwayê nemir û Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, mezintirîn bersiv e bo rejîma terorîstperwer a Îranê ku Qasimlo di rêbaza xwe de zindî ye...

Roja cîhanî a Karkeran li hemû karkerên Kurd pîroz be



N: Nûredîn Sofîzade



1'ê meha Gulanê roja cîhanî a Karkeran e û bi vê helkeftê, her sal di vê rojê de li piraniya welatên cîhanê ji bo rêzgirtin ji ked û zehmeta karkeran rêwresm tene lidarxiştin. Li hin welatan ew merasim û cejn ji aliyê hikûmet yan sendîka û navend û NGO'an ve tene lidarxiştin û pîrozkirin. Ev jî, ji bo rêzgirtin ji pêkhatiya civakê a herî zehmetkêş anku karkeran e ku barê giran ê kar li ser milên wan e.

Lê em bizanin rewşa van îzakêşên welatê me Îran û bi taybetî Rojhilatê Kurdistanê çawan e û çawan rêz ji keda wan tê girtin? Di siya reş a rêjîma Îslamî de, zêdebarî rewşa xirab a piraniya xelkê Îranê, rewşa karkeran çend qat xirabtir e. Ji ber siyasetên şaş ên rêjîmê, rewşa aborî a xelkê xirab bûye.

Ev jî bûye sedem ku kar kêmbê, dahat kêmbê, karker neçar bin ji bo peydakirina nanê rojane, karê pitir û di-jwartir bikin û di hember de destheqek kêmbîstînin. Ev jî tê wateya bikaranîna hêz û wizeyêke zêde li hemberî pereyekî kêmbî.

Li gor amarên navendên rêjîmê bixwe, heqdeştî %70 karkeran têra debara jiyana wan nake. Rojane nûçeyên di derbarê dîrxîstina karkeran de tene belavkirin. Hin kargeh tene girtin û di encamê de sedan karker bê kar dibin.

Di warê siyasî de jî karker û zehmetkêşên welatê me, pêkhatiya herî tepeserkirî ne û rêjîm, îzna pêkanîna meşên nerazîtiyê û xwenîşandanan nade wan. Tevahiya nerazîtiyên karkeran ji aliyê rêjîmê tene bêdengkirin. Bi sedan

karker û dehan çalakvanên mafên karkeran di girtîgehên rejîmê de ne.

Îsal jî di roja 1'ê Gulanê de ku roja cîhanî a Karkeran e, dema ku li çendîn bajarên mezin ên Îranê, karkeran dixwestin bi xwenîşandanên aram û girseyî xwestekên xwe ên rewşa bînin ziman, ji aliyê hêzên rejîmê ve raştî êrîş û tepeserkirin û bêrêziyê hatin û gelek çalakvan jî hatin binçavkirin.

Karkerên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, ji karkerên navçeyên din ên Îranê belengaztir in û mafên wan, ji karkerên navçeyên din zêdetir hatine zewtkirin. Ji bilî vê rewşa xirab a karkeran li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, pitir ji %80 karkerên Kurd, karê azad anku reş dikin. Ji mafê bîmê bêpar in, dema bûyerên kar ti navend,

û sendîka û ti organek bi awayekî berpirsyarane riftarê bi wan re nake û xwe berpirsyar nabîne.

Herwisa navendên rêjîmê, karê fermî nadin karkerên Kurd. Hemû nerazîtiyên karkerên Kurd raştî êrîşa hêzên rejîmê tene û rejîm, çalakiyên wan, ewlehî û siyasî dibîne.

Li welatên pêşketî, desthilat û dewlet, rêzê ji karkeran digirin. Lê berovajî van welatan, li Îrana jêr desthilata dîktator a rêjîma Îslamî, tevahiya rojên reş û belengazî û bê mafî û sivikatî bûne para karkeran. Em hêvî dikin ku demeke nêzîk, ew roj were ku karkerên welatê me jî bi serbestî û durî dîktatoriya Îslamî bigihin mafên xwe û jiyaneke serdemiyane derbas bikin û kesatiya raştî a xwe bi dest bînin.

Hikûmeta Îranê amarên bidarvekirîyan eşkere nake

Saziya Mafê Mirov a Îranê daye zanîn ku, di Befranbara 1397`an de, du hepsî ku di girtîgeha bajarê Îlamê de bûn hatine îdam kirin.

Saziya Mafê Mirov a Îranê, di nûçeyekê de daye xuyakirin ku: Zanyariyên nû nîşan didin, di Befranbara sala borî de, du kes di girtîgeha Navendî a bajarê Îlamê bi tawana "qetilê" hatine îdamkirin, li gorî hinek li çavkaniyan ku ragehandine, yek ji wan kesên ku hatiye bidarvekirin, di heyama desteserkirinê de, temanî wî xwarê 18 saliyê bûye.

Li gorî gotina wê saziyê, roja 26`ê Befranbara 1397`an, du hepsî li girtîgeha Navendî a bajarê Îlamê hatine îdam kirin, û ew du hepsiyane bi dosyayên coda bi tawana "kuştina bizanebûn" cezaya bidarvekirinê bo van hatibû birîn.

Saziya Mafê Mirov a Îranê nasnameya wan du hepsiyên wiha daye zanîn, "Mes`ud Nazirî" kurê Fazil ku li temenê 19 saliyê de, bi sebeba şerkirinê raştî bûyera "qetilê" hatibû, û di temenê 23 saliyê de jî, cezayê bidarvekirina wî hatiye lidarxiştin, û "Ferhad Ekberî" kurê Heyder û di temenê 15 saliyê de, bi sebeba şerkirinê raştî "qetilê" hatibû.

Bi derbazbûna 3ê mehan bi ser bidarvekirina wan du girtiyan, heya niha jî tu medyayeke hikûmetê ev nûçeya nedaye weşandin.



Ferhenga Gurcî-Kurdî yekemîn ji ferhengên kurmancî û zimanek biyanî ye ku heya niha li Gurciştanê hatine weşandin.



Di pêşgotina pirtûkê de mamoşta Kerem Anqosî deştîşan dike ku, ev ferheng bi taybet ji bo rûniştvanên Gurciştanê yên Kurd û gurcî ye, ku dixwezî zimanê Kurdî bizanibin û hîn bibin.

Kesên bixwazî dikarin pirtûkê bi armanca fêrbûna kurmancî jî bikar bînin.

Li gor malpera Riya Tazayê roja Şemiyê, 27`ê Nîsana 2019`an, li Mala Kafkasyayê ya bajarê Tbilîsîyê (House of Caucasian) de nasandina pirtûka Keremê Anqosî “Ferhenga Gurcî – Kurdî ya kurt bi devoka Kurmancî” pêk hat.

Li wê civînê hejmareke mezin ji nunerên civaka Êzdî ya bajêr amade bûn û piştî axavtî û pîrozkirinê dilgerm ferheng di nav beşdaran de bi awayekî belaş hate belavkirin.

Keremê Anqosî di dawîya axaftina xwe de got: “Ji bo dersên Kurdî di pêşerojê de bi rêk û pêk bîn kirin pêdiviya civaka me zûda bi vê ferhengê heye.

Ji bo ku xwendevan bi hêsanî karibin peyvên wate ku her roj û zû-zû bikar tînin jê hîn baştir sûd wergerin.”

Keremê Anqosî peyvên gurcî yên bi Kurdî hatine dayîn

ev ferheng bikarbartir ango pratîktir kiriye.

Di ferhenga Gurcî-Kurdî de 112 rûpel û 5050 peyv hene. Elîfbaya ferhengê Kurdiya latîni ye û peyvên gurcî jî bi alîfabeya gurcî cih digirin.

Ferheng bi alîkarîya finansî ji aliyê xêrdarekî Kurdê Êzdî Sûlîko Sîmaev hatîye weşandin.

Ev xebata çaremîn a Keremê Anqosî di warê zimanzanîyê ye, ku berê ferhenga Gurcî-Kurdî bi zaravê soranî amade kiribû û ew di sala 2014`an de çap kiribû.

Nivîskar, rojnamevan, rojhilatnas, karkirê radyoya Ronkayî, danerê gellek pirtûkan û gotarên zanîstiyê Keremê Anqosî ev ferheng di encama xebatê salakê de amade kir.

Kurte filma pêşmerge xelata navdewletî wergirt



hatinî çandin û yên bicih mayî yên terorîstên “DAÎŞ”ê bûye.

Lijneya danaberhev ya vê festîvalê, li ser vê kurte filma dëkumintariyê ragehandiye, çîroka vê kurte filma dëkumintariyê bas ji çîroka girîng dike ku pêşmerge bi gorîkirina jîyan û canê xwe, canê, welatîyan diparêzin.

Serwer Ebdula, derhênerê vê dëkumantariyê, derheq çêkirin û derhîneriya vê kurte filma dëkumntarî bo medyayên Başûrê Kurdistanê ragehandiye ku: Fîlim di demekê de hatiye giritin ku di vê demî şerê terorîstên “DAÎŞ”ê bû, û em mejûlî çêkirina vê filimê bûn ku zêdey caran her bi vê sedemê jî heya nêzikî mirinê diçûn.

18.mîn festîvala navdewletî ya li Beyrûte, ku kêmî li hefteyekê li bajarê Beyrûta paytexta welatê Lubnanê hatibû lidarixstî, roja Duşemî 2`ê Banemerê, bi amadebûna sedan filmên coda û li welatên cuda yên cihanê deştîpê kir û roja Yekşemî 8`ê Banemerê dawî pê hat.

Kurte filmeke dëkumintarî ya pêşmerge, xelata 18.mîn festîvala navdewletî ya li Beyrûte vergirt.

Kurte filma dëkumintarî ya ku li ser pêşmerge û bi navê “rûbirûbûna li hemberî mirinê”, ku bi derhîneriya Serwer Ebdula, xelkê Başûrê Kurdistanê, li 18.mîn festîvala navdewletî, li Beyrûta paytexta welatê Lubnanê, wekî baştirîn filma dëkumntarî hate hilbijartin û xelata vê festîvalê jê re hate pêşkêş kirin.

Ev kurte filma dëkumntarî bas ji qehremanetî û bivêriya pêşmerge li şerê lidiî teror û terorîstên “DAÎŞ”ê dike û bi taybet bas li van pêşmergeyan dike, ku, erka van poçkirin û hilgiritina mîn û bombeyên

Helbestvanê Kurd li Rojavayê Kurdistanê çû ber dilovaniya xwe



Helbestvanê Kurd yê bi navê Ferhan Hisê yê naskirî bi (Seydayê Dilbirîn) li bajarê Qamişlo ya ser bi Rojava Kurdistanê çû ber dilovaniya xwe.

Seydayê Dilbirîn helbestvanê Kurd ku, piştî demekê ji nexweşiya şêrpenceyê bi ser dibir, û di temenê 73 saliyê de li bajarê Qamişloyê koça dawiyê kir.

Seydayê Dilbirîn di sala 1946`an de li gundê Çaxir Bazar jîdayîk bibû, û di jiyana xwe de 3 dîwanên helbestan çap kirin û berhemeke wî ya çapnekirî jî heye. Seydayê Dilbirîn helbestên kilasîk jî dinivîsand û bandora Seydayê Cigerxwîn û Tîtej lê hebû, û Seydayê Tîrej bixwe navê Dilbirîn li ser dana.

Bi beşdariya hejmarek ji nivîskar û rewşenbîrên herêma Cizîrê termê Seydayê Dilbirîn li gorîştana Hilêliyê li bajarê Qamişloyê bi axê hate spartin.

Zimanê Kurdî

Wek :

- Tu çilo hatibî, tu çilo çûbî ne xem e !
- Em çilo xweşiya xwe bibînin em ê wilo()bikin

Têbînî :

Bêjeya “lo” ya ku di şewezarê rojbeyaniyan de bi wateya (reng) bikar tê, dibe ku ji gotina Erebî “lewn” hatibe.

“Çend” :

Cînavê “çend” jî cînavêkî lêkdayî ye. Ji pevxiştina cînavê sade “çi” + “hind” (hin) pêk hatiye. “Hind” jî cînavêkî (navêkî) nebinavkirî ye, bi wateya (tibab, qeder) tê û di pêvajoya gotinê de bo destnîşankirina jimareke nenas bikar tê .

Wek : - Ka hindek (hinek) şekir bide min.

(Ka şekirî – tibabek şekir...)

- Hindek caran em hev dibînin

(Carinan – carine nejimartî...)

- Em ê hindekî vehesin .

(Em ê bîstekê – demeke nenas vehesin.)

Diyar e ku cînavê “çend” têgeha xwe ya pirsyariyê ji cînavê “çi” wergirtiye. Lê watedariya jimara xwe ji bêjeya “hind” û pêgirên wê distîne. Bi vê egerê jî ev cînavê lêkdayî, bi şeweyekî pirsyarî jimara navên berpirs zelal dike. Wek : - Te çend pênûs kîrîne ?

(Min (5) pênûs kîrîne)

- Em ê çend rojan li welêt bimînin ?

(Em ê (8) rojan li welêt bimînin)

- Ev çend rastek in ?

(Ev (3) rastek in)

Ev cînavê pirsyarî “çend”, bêjeyeke guhêrbar e, li gora rawe û demên hevokan tê guhertin. Anku, bêjeyeke berwerê e, dikeve ber rêzanên tewandinê û nîşandekên verê lê xuya dibin . Wek :

- Ji van hevalan tu çendan dinasî ?

- Rûberê vê zeviyê çend bi çendan e ?

- Tu çendî dixwazî ?

Gelek caran jî, cînavê “çend” ji çarçewa pirsyariyê der diçe û wekî cînavêkî nebinavkirî (bê pirsyarî)

bikar tê . Wek :

- Çendî Ev gulistan xweş e !
- Çend caran min li te pirsî, lê min tu nedîtî .
- Ez ê çendekî (çendakî) dîtir biçim Amedê .
- Çend dostên min hebûn, ew jî mişext bûn.

Cînavê “çend” jî weku pîrriya cînavan, di rêxiştina hevokan de, dibe kara, berkarê rasteder û berkarê nerasteder. Wek :

1-Kara:

- Çend mirov ji Amedê hatin ?

- Çend birayên Zînê hebûn ? - Çend hevalên te penaber bûne ?

2- Berkarê rasteder:

- Te çend pênûs diyarî kirin ?

- Hûn çend jimarên rojnameyê dixwazin? - Salar çend xelat wergirtine ? 3- Berkarê nerasteder:

- Ev roja çendê ye ku tu li vir î ?

- Te mêweyên çend daran berhev kirine? - Ji van hevalan tu navên çendan dizanî ?

“Çiton” (Çitov) :

“Çiton” an jî (çitov) cînavêkî lêkdayî ye. Ew jî, ji cînavê xwerû “çi” û bêjeya (ton) hatiye pevxiştin. Bêjeya “ton”, li gora ku li hin navçeyên kurdiştanê bikar tê û bi van wateyan berçav dibe : - Seyda Elî Seydo Goranî di “Ferhenga Kurdî Nûjen”() de dibêje : (Ton : Reng, form, wêne, çawanî). - Zanyar Gêwê Mukriyanî di ferhenga “Kurdiştan”() de dibêje :

Di kurmanciya bakur, çiyayê Kurmanc, Kurdaxê de : Ton :

Awa, reng, çeşn, çiloyî, çawa, şewe.(Bi vî tonî : Bew çeşne).

Li gora van wateyan, cînavê “çiton” bo zelalkirina rewşa çawanî bikar tê . Wek : - Tu çiton î ? (Tu çawa yî ?)

Bi dîtina min, hevgerîna cînavê “çi” û bêjeya “ton” ne wekî pevxiştina cînavê lêkdayî (çi-ra, çi-lo, çi-ma, çi-awa...) ku berdewam bi van raweyên lêkdayî : (Çira, çilo, çima, çawa) hev girtine . Anku, gelek caran (çi) bi tena xwe bikar tê û (ton) jî, bi tena xwe bikar tê : Wek :

- Bi çi tonî tu çuyî ?

(Bi çi şeweyî tu çuyî ?) - Karê te bi vî tonî ne durîst e (Karê te bi vî awayî ne durîst e) Ji ber vê egerê jî, em nikarin bêjeya “çiton”, di her raweyê de, weku cînavêkî pirsyarî yî lêkdayî bibînin . **Dom heye...**

Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiştanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (349)

Rêûresma dewrên Fermandehiyê yê "Hêza Pêşmerge Kurdiştanê" dawî pê hat



Li ser sînorên Rojhilat û Başûrê Kurdiştanê, rêûresma dawî pê hatina dewrên fermandehiyê yê "Hêza Pêşmerge Kurdiştanê" hate lidar xisitîn.

Roja Pêncşemî rêkefta 12`ê Banemerê, li ser sînorên Rojhilat

û Başûrê Kurdiştanê, ji aliyê Fermandehiya "Hêza Pêşmerge Kurdiştanê" ve, rêûresma dawî pê hatina dewrên fermandehiyê, bi amadebûna beşeke xuya li fermanderên leşkerî yê Hêza Pêşmerge hate lidar xisitîn.

Dewrên fermandehiyê

yê 2 û 4 li meha Ser-maweza sala 1397`an deştê kir, û dewrên han ku li çend aştan hatibûne lidar xistin, wiha ne: Dewrên fermanderî, birêveberî, dewrên giştî yê leşkerî û dewrên taybet yê pisporiyê.

Di van dewran de komek fermander û pêşmergeyan karîn beşdar bin, û li warê zansitî, hizrî û taktîkan, û herwisa ezmûnên din li ezmûnên xwe zêde kirin.

Rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" deştê kir. Piştî "Kawe Behramî" Fermanderê

"Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdiştanê" piştî arayêşa leşkerî ya "Hêza Pêşmerge Kurdiştanê", gotarek bi veboneyê pêşkêş kir.

"Kawe Behramî" di axavtina xwe de, îşare bi rewşa niha ya xebat, rewşa siyasî û aboriya navxweyî Îran û rewşa Kurdiştanê kir, û di berdewamiya axavtina xwe de, îşare bi biryara bi terorîst nasandina Spaha Pasdaran ji aliyê Amerîkayê ve kir.

Navbirî got: "Em 40 sale digel Spaheke terorîst û dagîrkar şer dikin û li hemberî veboneyê de sekinîne û li wir şûnda jî berxwedaniya

xwe li hemberî van terorîstan berdewam dikin.

Di beşeke din a veboneyê de, rapora bi dawî hatina dewran ji aliyê "Sidêq Dervêşî" cihgirê Fermander û berprisê heyeta birêveberiya dewrên fermandehiyê pêşkêş kir.

Her di veboneyê de, "Pêşewa Mihemedî", "Yasîn Qadirî" û "Selam Girdesûrî", çend şran, helbest û sirûd pêşkêş kirin.

Rêûresm bi rêjeya beşek li pêşmerge û fermanderên amadebûyî li dewrê, dawî pê hat.

Femanderekî berê yê Hêza Pêşmerge Kurdiştanê çepera xebatê sparte hevalên xwe

Femanderekî berê yê Hêza Pêşmerge Kurdiştanê, li welatê "Sweden", koça dawî kir.

Roja Duşeme 9`ê Banemer(29`ê Nîsan)`ê, fermanderê lêhatî yê bi navê "Hesen Zar`î" naskirî bi "Hesen Sersipî" çû ber dilovaniya xwe.

Femanderekî Hesen Sersipî, sala 1318`an


li gundê "Selewatava" ya girêdaiy bajarê Sine jidayîk bibû.

Femanderekî Hesen Sersipî hemû demî digot, "Yek ji şanaziyên temenê min eve ku, di dirêjahiya jiyana xwe de pêşmerge bûme". Navbirî qonaxên xwendina xwe li hocra mizgevt û xwendingehên hikûmetê de tewav kiribû.

Malbata xwedêjêrazi Hesen, bi sedema têkoşîn û piştevanîkirin li Partiya Demokrat, ji aliyê hêzên dagîrkar yê rejîmê ve raştî givaş û gefan dihatin, lê, tu demî xwe bo daxwazkariyên rejîma Îranê, neçemandin û bi sebebê givaşên rejîmê jî neçarbûn Kurdiştana Rojhilat biterkînin û li Kurdiştana Başûr bibin bi koçber.

Navbirî heya dawîya jiyana xwe, emegnasê rêbaza PDKÎ û rêbaza şehîdên Kurdiştanê ma.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, sersaxiyê dibêje malbat, xizm û kesûkarên wî femanderekî lêhatî, û xwe şirikê veboneyê xema van dizane.



Pêşmergeyên Bajar li Urmîyê alaya Kurdiştanê hildan

Pêşmergeyên Bajar li deverên Urmîyê çalakiyên teblîxî lidar dixînin.

Roja Yekşemî, 8`ê Banemerê (28`ê Nîsana 2019`an) pêşmergeyên Bajar li geliyê Qasimlû û devera Deştêpêl a girêdaiy bajarê Şinoyê, bi hildana alaya Kurdiştanê û danîn cemedanî û gulên He-

lale çalakiyên teblîxî birêve birin.

Herwisa pêşmergeyên Bajar di peyamekê de ragehandin: Em Pêşmergeyên Bajar piştevaniya xwe li PDKÎ radigehînin û hişdariyê didin çax û kirêgirtiyên da ku bizivirin himbêza gel.

Herwisa şeva Yekşemî 8`ê Banemerê, endam

û alîgirên PDKÎ li bajarê Sahêb ya girêdaiy bajarê Seqîzê, tirakt û postêrên taybet bi terorîst nasandina Spaha Pasdaran ya rejîma Îranê ku ji aliyê Dezgeha Rêkxiştina giştî ya PDKÎ hatine belavkirin, çalakiyên teblîxî li dijî Spaha Pasdaran a terorîst ya rejîma Îranê lidar xistin.

